ŞERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com | Hejmar: 10 | Dîrok: Cotmeh 2023 | Biha: 1000 | DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ

YEKÎTIYA GELAN MISOGERIYA AZADIYÊ YE

Şoreşa me ji her alî ve bi faşîst, înkarker, xayin û dewletên herêmê yên paşverû ve hatiye dorpêçkirin. Lê ligel vê berxwedaneke bêhempa nîşan dide. Şoreşa me ya Rojava parçeyê rizgarkirî yê Kurdistanê ye û piştre jî derbasî xaka Sûriyê bû. Ji ber vê yekê ji destpêkê de bû hedefa hemû dijminan. Şoreşa me rihê yekîtiyê peş xist û hemû dijminên me bi hêrsekî mezin hewl dan ku bi rêbazên şerê taybet ên nû wê tune bikin. Ji ber ku hêviya azadiyê ya ku li axên Rojhilata Navîn geş dibe, dibe kabûsa hemû dijminên me. Gelên bindest ên Rojhilata Navîn ên ku azadiyê dixwazin agirê şoreşê di dilê xwe de hîs dikin.

Gelên Kurd-Ereb-Asûrî-Suryan-Tirkmen ên ku bi sedsalan tê xwestin ku li hemberî hev bên çewisandin di dîroka xwe de cara yekem hatin cem hev û gîhaştin asta ku bi hev re şoreşekê pêş bixin. Mezinkirina ev rihê yekîtiyê tê wateya ku wê planên qirêj ên desthiladariyên faşîst têkçûneke bê veger bijîn. Îro li Dêrazorê bi destê çeteyên girêdayî dewleta Sûriye, Îran û Tirkiyeyê di bin navê eşîran de êrişa Rêveberiya Xweser dikin. Lewma jî bi rêya ENKSê propagandaya reşkirina şoreşê dikin. Gelê me êdî dizane ku yekîtî, yekane misogeriya azadiyê ye. Dema ku ev misogerî di destê me de be, tenê ew e ku em şoreşa xwe bigîhinin sosyalîzmê. Em yekîtiya xwe mezin û şoreşa xwe geş bikin!

2 ROJEV: Xwedî Li Kurdistanê Derkeve. Ji Bo Wê Şer Bike û Rêxistin Bibe

3 NEZERIYE: Misogeriya Azadiya Neteweyî; Kurdistana Sosyalîst Yekbûyî ya Azad e

6 SERPÊHATÎ: Li Rojava Tûgayekî Sor

7 CIWAN: Li Dijî Koçberî û Hişbirê Têkoşîn

Xwedî Li Kurdistanê Derkeve. Ji Bo Wê Şer Bike û Rêxistin Bibe

Zanyarê ku di salên 1330an de li Tûnisê jiya bû Îbnî Haldûn gotibû "erdnigarî qeder e" Bi taybetî bi hilweşîna împaratoriya Osmanî û bi şerê yekemîn ê cîhanî qedera Rojhilata Navîn ji nû ve teşe girt. Netew, netewên hindikanî, olên semawî, terîqet, eşîran ne karîbûn li derdora hikûmetekî navendî kom bibin, ne jî karîbûn yekîtiyeke demokratîk, dildar û wekhev ava bikin. Sedsala 20emîn her ku çû ket nava qeyraneke binyadî.

Rizgarbûna Kurdistana mêtîngeh ji zincîrên xwe, di diyarkirina çarenûsa Rojhilata Navîn û di çaresariya ev qeyrana binyadî de xwedî roleke stratejîk e. Netew dewlet û emperyalîstên ku Kurdistanê di bin nîra mêtîngeriyê de digirin di ferqa girîngiya rola Kurdistanê de ne. Sedema şerê gelemper ê wan ê leşgerî, çandî, siyasî û aborî ya li dijî mafa yekîtiyê, mafa çarenûsa netewa Kurd ev rastî ye.

Di destpêka sedsala 21êmîn de di heyama ku Emerîkayê Iraq dagir kir de, herêma federe ya Kurdistana Başûr ku navenda wê Sileymeniye û Hewlêr e hat îlankirin. Ev gava ku bi Emerîkaya emperyalîst ve hat avêtin, ji bo çaresariya Kurdên Bakurî yên ku gundên wan hatin şewitandin û di şekenceyan re derbasbûn e. Çima niha ev Kurt nikarin biçin Hewlêrê? Çima Mexmûr di bin dorpêçê de ye? Di qadên PDKê de çima PKKê, gerîla û Kurdên li Mexmûrê weke terorîst tên dîtin? ji vê berjewendiya Berzeniyan û PDKê çiye?

Di asta ku em gîhaştine de PDKê teva dewleta Tirk di şerê tunekirina Kurdan de rasterast erk girtiye ser milên xwe. Di pêvajoya dawî de bi taybetî amadekariyên dewleta Tirk di destpêkê de ji bo dagirkirina Biradost û hin qadan heye. PDKê jî ji bo valakirina gundan û bicihbûna hêzên leşgerî yên Tirk her cure piştgirî dide dewleta Tirk. PDKê, biryardariya xwe ya rol lîstina di şerê yekûn ê li dijî gelê Kurd û gerîlayê azadiyê de careke din îspat kir. PDKê û rêbertiya wê Berzaniyên ku pêşengên demekê yên têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurd bûn niha bûne dijminê gelê xwe. Malbata Berzanî di PDKê de, PDKê jî di dewletê de şênber bûye. Sînorên çaresariya pirsgêrêka neteweyî ya di bingeha burjuva de careke din hat dîtin.

pirsgêrêka Kurd re çaresariyeke burjuva dianî û di wê demê de gaveke pêşverû bû. Lê di hundirê xwe de xetereyên cidî dihewand. Welatparêzên Sosyalîst ev xetere her tim di rojevê de girtin û li dijî hevkaran têkoşiyan.

Di nav van salan de Berzanî û PDKê bi AKPê/MHPê ya mêtînger a faşîst re hevpeyman çêkir. Rê li ber vekir ku Başûrê Kurdistanê bizivire wîlayeteke dewleta Tirk, an jî gîhaşt asteke ku bi awayekî eşkere piştgirî dide dagirkeran. Îro xeta PDK/ENKSê li Kurdistanê li pêşiya mafa çarenûs, rêxistinbûn û xweparastina Kurdan gîhastiye merhaleyeke ku dibe asteng. Di 18ê Îlonê de nûnerê KNKê Cewdet Bûlbunê ku ji bo yekîtiya neteweyî têdikoşiya di qada desthiladariya PDKê de bi sûîqestekê hat qetilkirin. Ev rewşeke gelekî xeter e. Hewlêr kê xist kontrola istixbarata dewleta Tirk? Çima Mazlûm Dag hîna di zindanê de ye? embargoya li ser Mexmûrê biryara kê ye? ên ku li Mexmûrê dijîn kî ne? herkes dizane ku ew

Kurdistaneke Cuda: Rojava

Yek ji raperîna şoreşa me ya herî girîng pêkhatina tifaqa Kurd û Ereb bû. Zehmetiya avakirina yekîtiya gelên ku ji hev hatine dûrxistin û dijminkirin, derbaskirina pêşbîryarên neteweyî, bêbaweriyên beramber ên dîrokî, tunekirina ciyawaziyên çandî û olî xebateke gelekî demdirêj û bêhnfireh pêwîst dike. Di mijara wekheviya mafê ya kamil û yekîtiya dildar de sekna rêgezî û bibiryar pêwîst e. Gerek Emerîka, Tirkiye û gerek jî hikûmetê Şamê tifaqa Kurd – Ereb gelekî xeter dibînin û di her derfetê de hewldana xirapkirina vê tifaqê didin.

Di milê hemleya QSDê ya "ewlehiya Dêrazorê" jî ev gelekî girîng e. Pêwîst e ku hem di milê leşgerî, hem jî di milê siyasî de encam bên derxistin.

Bi taybetî dewleta Tirk a faşîst û dagirker bi reşkirinê xwest ku tifaqa Kurd û Ereb bizivirîne qelsiyeke mezin. Dîsa jî xwest ku bêbaweriyeke siyasî biafirîne û li Minbic û Til Temir vê bike sedemeke dagirkeriyê. Di heman rojên pirsgêrêka Dêrazorê de li Minbic û Til Temirê êrîşên nû yên dagirkeriyê hatin pêkanîn. Ragihandina Tirk hîna di saetên yekemîn de îlan kir ku gundê Tewîla û Minbic ketiye destê çeteyan. Em hêza Tûgaya Elîşêr Denîz ku parastina xeta cepheya Tewîla ya Til Temir girtiye ser milên xwe, tevahî hêza eyaleta Til Temir, Minbic û şervanên ku di hemleya Dêrazor û tevahî cepheyan de cih girtine pîroz dikin.

Xuya ye ku ev tifaqa Kurd û Ereb hîna li ser sûda siyasî ya beramber ava kiriye, bingeha wê hîna gelekî ne xurt e. Rêxistinbûna li ser esasa Malbatî û eşîrtî, bi awayekî komî guhertina hêl dibe sedema derketina holê ya qelsiyên cidî. Divê karker û kedkarên Ereb hîna zêdetir ji bo xisleta şoreşger a gelparêz ya şoreşê bên qanehkirin û yek bi yek di nav refên şoreşê de bên rêxistinkirin. Hîna di nav gelê me yê Kurd de li dijî gelê Ereb bêbawerî û kêmdîtin heye. Divê em li dijî vê têbikoşin. Divê manewiyata şehîdên Kurd û Ereb ên ku di heman şehîdlîkan de li cem hev radizên bibe moral û hêz.

Êrîşa yekemîn a DAÎŞê ya li ser şoreşa Rojava ya ku di 19ê Tîrmeha 2012an de hatiye îlankirin di 15ê Îlona 2014an de bi hevkariya dewleta Tirk li Kobanê hat jiyîn. DAÎŞ di wê heyamê de xurt bû. Teva Mûsûlê qadeke berfireh a Iraqê dagir kir. Bi dagirkirina Reqayê dest danî ser bi dehan sîlehên giran ên hikûmetê Şamê. Bi vê hêzê di cepheyên cuda de ber bi Kobanê ve meşiya. Bi berxwedaneke bêhempa ya gelê Rojava, gerîla, şoreşgerên enternasyonal, welatparêzên sosyalîst, gelên herêm û cîhanê ev êrîş hat şkenandin û Kobanê hat azadkirin. Em îro careke din berxwedana Kobanê silav dikin, şehîd û gaziyên xwe bi rêzdarî silav dikin. Em di salvegera dagirbûna Serê Kaniyê û Girê Spî de ne. Weke Kobanê em ê ji van bajarên xwe jî dagirkeran bidehfinîn û axên xwe ji nû ve azad bikin.

Em di salvegera 12emîn a di şoreşê de ne. Û di şertên şer ên berdewam de pirsgêrêk û pêwîstiyên avakirina şoreşê her ku diçe zêdetir dibin. En ku ax û welatên xwe diterîkînin zêde dibin. Pirsgêrêkên aborî hene. Lê ev pirsgêrêk nikarin bibin sedema dev jê berdana şoreş, bêbawerî û bêmoralî. Elbet rexneyên me yên welatparêzên sosyalîst jî hene. Em ji bîra nekin ku şoreşa me di bin dorpêçê de ye û divê em li gorî vê pêşniyarên çaresariyê pêş bixin. Divê em bi awayekî çalak tevlî civînên gel ên li qadan bibin û bi vî rengî tev bigerin. Lê hîna girîngtir ger ku pêşniyar an jî nêrînek bi rêxistinê re negîhîje hev, hêzeke ku li paş rêxistinê kom bibe dernekeve holê tu bandora ev rexne û pêşniyaran nabe. Di destpêkê de rêxistinkirina jin û ciwanan erka herî bingehîn e. Ligel pirsgêrêk, kêmasî û rexneyên me dîsa jî vir Kurdistaneke cuda ye. Ev Kurdistan şoreşger e. Li vê Kurdistanê jin niviyê desthiladariyê ne. Ev şoreş şoreşa jinê ye! Em Kurdistana xwe û şoreşa xwe biparêzin!

Misogeriya Azadiya Neteweyî; Kurdistana Sosyalîst a Yekbûyî ya Azad e

Kurdistana ku ji aliyê dewletên emperyalîst û dewletên herêmê yên paşverû ve hat parçekirin, hat mêtîngehkirin. Bi sînorên ku hatin kişandin navbera çar parçeyan xwestin ku gelê me ji hev qut bikin. Hebûna me ya neteweyî hat înkarkirin. Ziman û çanda me hat qedexekirin. Gelê me di komkujiyan re hat derbaskirin û hat asîmîlekirin. Me bi sepanên nemirovî zilma herî giran jiya. Li Rojavayê Kurdistana ku parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê ye gelê me bi şoreşa 19ê Tîrmehê azadiya xwe bi dest xist. Serdestiya rejîma BAAS a ku xwe dispêre mêtîngerî û înkara neteweyî hilweşiya. Gelê me yê Kurd ku bi salan çand, ziman û hebûna xwe ya neteweyî tune hat hesibandin, ji bo ku xwe bi xwe bi rê ve bibe Rêveberiya Xweser ava kir. Gelên Ereb, Suryan, Ermen û HWD. yê ku li herêmê dijî jî tevlî şoreşê bûn. Bakur û Rojhilatê Sûrî bi pergala xwe ya demokratîk û gelparêz ku spartiye yekîtiya wekhev a gelan ji bo gelên Rojhilata Navîn bû deriyekî azadiyê.

Li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûrî gelên me hem avakirina jiyana nû berdewam dikin, hem jî ji bo parastina destkeftinên şoreşê berxwedaneke mezin pêşkeş dikin. Li Bakurê Kurdistana ku ji aliyê dewleta Tirk a faşîst ve hatiye mêtîngehkirin siyaseta înkar û îmhayê (tunekirin) didome. Dîrok wekî komkujiyên ku li Dêrsîm, Koçgîrî, newala Zîlanê hatiye jiyîn bû şahîdî bi dehan êşan.

Darên îdamê hatin damêzrandin, wekî zindana Amedê navendên şkenceyan hatin avakirin. Azadiya rêxistinbûn, çalakî û gotin hat çopandin. Siyasetmedar û hevserokên şaredariyan bi salan e di zindanê de ne, bi rêya qeyûman şaredariyên me hatin çopandin. Çiyayên me hatin bombebarankirin, bi sedan gundên Kurdistanê hatin şewitandin, navên gundan hatin guhertin, bi hezaran kes di bin çavan de hatin windakirin û qetilkirin.

Li Rojhilatê Kurdistanê mafên gelê me yê kolektîf ên neteweyî yên gelê me tune tê hesibandin. Daxwaza herî biçûk ji aliyê rejîma Melelî ya Îranê ve bi îdamê tê bersivandin. Gelê me bi serhildan û xurtkirina rêxistinbûnê hewl da ku li ser piyan bimînin. Sala par piştî hatin qetilkirina Jîna Emînî serhildana "Jin Jiyan Azadî" ya ku destpêkiriye tê xwestin ku bi xwînê were perçiqandin.

Başûrê Kurdistanê ya ku bi hevpeymana Lozanê hatiye radestî serdestiya dewleta Iraqê kirin, piştî ku statü bi dest xist bi sedema xeta hevkarî û xiyaneta PDKê û eşîra Berzanî ber bi tunebûnê ve tê kaşkirin û di bin gefa dagirkeriya dewleta Tirk de ye. Her tim êrîş tên birin ser qadên gerîla, Şengal, Mexmûr û Sileymaniyeya ku di kontrola YNKê de ye. Dewletên Tirkiye û Iraqê wekî ku li Hewlêrê tê jiyîn dijminatiya navbera gelan xurt dikin. Têkoşîna azadiyê ya li dijî koletiya 100 salan a gelê me didome. Gelê me yê ku ji bo hebûna xwe ya netewî ji şerkirinê natirse, li dijî nîra mêtîngeriyê berxwedaneke dîrokî ya bedêlên mezin pêşkeş dike.

Xeta Welatparêziya Sosyalîst

Dema ku ji bo destxistina azadiyê û mayindekirina destkeftinan hewldan didomin, di şoreşa Kurdistanê ya ku ji bo şoreşên herêmî yên Rojhilata Navîn gelekî girîng e de gelo xeta welatparêziya sosyalîst roleke çawa ya dîrokî bi dest dixe?

Xeta welatparêziya sosyalîst; esasgirtina têkoşîna çînî û neteweyî ya ku spartiye bernameya şoreşger a ku Marksîzm-Lenînîzmê bingeh digire ye. Di aliyekî de bi berdewamkirina hebûna dewletên burjuva yên ku Kurdistan mêtîngehkirin, di aliyekî de bi naskirina mafên kolektîf ên netewa Kurd û avakirina di bingeha xweseriyê de ji nû ve avaniya îdarî, azadiya netewî ya gelê Kurd di milê mafê çarenûsê de têre nake.

Hedefa xeta welatparêziya sosyalîst hilweşîna dewletên faşîst û mêtînger, bi rakirina sînoran û yekkirina çar parçeyê Kurdistanê afirandina Kurdistaneke sosyalîst, serbixwe û azad e. Ji ber vê dehfandina hêzên dagirker û mêtînger ku bi qereqol û zindanên xwe dixwazin gelên me tune bikin, bi navendên xwe yên asîmîlasyonê hewldana dûrxistina gelê me ji çanda xwe didin, hêzên dagirker ku dewlemendiyên me yên binerd û sererd talan dikin erka yekemîn e. Em dikarin bi vê rêyê dawî li nîra înkarê ya netewî bînin.

Gava duyemîn jî, li dewsa dewletên burjuva yên ku têkîliyên hilberana kapîtalîst tê de hikmê xwe dajon avakirina yekîtiyên federatif ên spartî rêxistinên gelê kedkar û di rêbertiya karker û kedkarên Kurdistanê de ber bi sosyalîzmê ve pêşvebirina şoreşê ye. Di esasê de welatparêzên sosyalîst pêşengên bindest û çîna karkerên Kurdistanê ne. Taybetmendiya ku xeta welatparêziya sosyalîst ji hêzên din ên ku têkoşîna şoreşger û demokratîk cuda dike jî ev e. Di serdema kûrewîbûna emperyaliyetê de ger ku têkoşîna rizgariya netewî venegere rizgariyeke civakî wê gelê Kurd di bin gefa mêtîngeriyeke bi şêweyeke nû bijî. Bûyerên ku li Başûrê Kurdistanê diqewimin jî îspata vê ye. Mêtîngeriya kevnare ji holê rabibe jî, di encama xeta hevkar a PDK-Berzanî de axên Başûrê Kurdistanê vegeriyaye mêtîngeha aborî ya emperyalîzm û dewletên herêmê.

Sosyalîzm û Şoreşa Rojhilata Navîn

Bi sedema hevpeymanên paşverû an jî nakokiyên navbera hêzên emperyalîst û dewletên kapîtalîst û burjuva yên herêmê axên Rojhilata Navîn hat zivirandin qada şer. Bi mîlyonan mirovên ji netew û baweriyên cuda li dijî zilm û mêtîngeriya ku li qada jiyana wan didome serî hil didin.

Xeta welatparêziya sosyalîst, yekîtiya minêkar a gelên herêmê û têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd esas digire. Li çar parçeyê Kurdistanê pêwîst e ku li dijî serdestiya dewleta burjuva ya mêtînger gelên bindest, karker, kedkar, gundiyên xizan ên ku tên mêtîngehkirin di xeta çaresariya kedkar de bên gel hev. Ji ber ku li çar parçeyê Kurdistanê azadiya gelên me di heman demê de bi hilweşîna dewletên kapîtalîst ên ku siyaseta înkar, asîmîlasyonê dispêre netew û baweriyên cuda gengaz e. Tenê bi vê rêyê mêtîngeriya li ser keda karker û kedkaran dikare rabe û netew û baweriyên bindest bigêhêjin azadiya xwe.

Ji bo wekhevî û azadiyê divê jin, ciwan, gundî, karker û kedkarên ji netewên cuda di nav têkoşînê de werin gel hev û yekîtî û rêxistinbûna siyasî ya van hêzan bê dabînkirin. Bernameya têkoşînê ya ku xeta welatparêziya sosyalîst datîne pêşiya me, belavkirina şoreşa Kurdistanê di herêmê de, federasyona Rojhilata Navîn a demokratîk û sosyalîst dike armanç. Gîhandina serkeftinê ya şerê rizgariya civakî û neteweyî ya Kurdistanê, di heman demê de têkoşînkirina ji bo şoreşa herêmê ye.

Ev derî encax di xeta welatparêziya sosyalîst de bi destgirtin û bicihanîna erkên têkoşînê yên heyamê dikare bê vekirin. Li Başûr, Bakur û Rojhilat ji bo sosyalîzmê mezinkirina têkoşînê û di vê xetê de rêxistinkirina gel erka me ya îro ye. Li dijî hêzên dagirkeriyê yên mêtînger bi awayekî fidayî parastina şoreşa Rojava, zêdekirina hilberana civakî, li dewsa milkê xas û têkîliyên hilberanê yên kapîtalîst pêşxistina şoreşê di alî şoreşa sosyalîst erkeke jiyanî ye.

Komûnîst wê bi rihê fidayî ya şehîdan û bi biryardarî têkoşînê mezin bikin, li her çar parçeyê Kurdistanê wê ala sosyalîzm, azadî û hêviyê bilind bikin. Em ser bikevin, ji ber ku em pêşeroj in.

Sosyalîzm û Keda Jinê Ya Hundirê Malê

Şoreşa me destpêkê de li Rojava dawî li desthiladariya dewleta Sûrî anî. Êrîşên dijminê jinê yên DAÎŞê û planên dewletên herêmê yên paşverû vala derxist. Bi vîn û parastina hevbeş a gelên me yên Kurd, Suryan, Ereb, Ermen, Tirkmen û hwd. ziviriya şoreşeke demokratîk a gelparêz. Taybetmendiya şoreşa me ya herî berbiçav jî şoreşa jinê ye.

Me wek jin bi vê şoreşê gelekî destkeftinên hiqûqî bi dest xist. Me di parastin û avakirina şoreşê de cih girt. Lê hem bandora ol û eşîrên ku di avaniya civakî de ne, hem jî bi tevahî zagonên xwe berdewamkirina pergala milkê xas li ber pêşvebirina şoreşa me ber bi şoreşeke hîna pêşverû ya sosyalîst ve astengiyên girîng in.

Sosyalîzm pêvajoyeke veguherînên şoreşger ên derbasbûna komûnîzmê ye. Di pergala sosyalîst de kapîtalîzm tê hilweşandin. Çîn, sînor, ciyawaziya zayendî ji holê radibe, milkê xas tê civakîkirin û bi vê rêyê wekheviya navbera jin û mêr tê dabînkirin, çavkaniyên dewlemendiyên civakî ji bo gel tê bikaranîn. Lê pêwîst e ku di her astê de pêvajoya şoreşa sosyalîst bi şoreşa jinê re bê meşandin.

Civaka sosyalîst a ku şertên madî yên rakirina ji holê ya her cure zexta mêr a li ser jinê pêk tîne wê tevahî karên ku dibe nîra jinê civakî bike. Sosyalîzm wê yekemîn milkê xas ku bingeha madî ya koletiya jinê pêk tîne civakî bike; a duyemîn jî bi civakîkirina keda jinê wê kedxwariya keda hundirê malê ji holê rake.

Di cîhanê de şoreşa yekem a mezin a sosyalîst şoreşa cotmehê ye. Ên ku çirûska yekemîn a şoreşê pêxistin jin bûn. Şoreşa cotmehê pergala milkê xas ku li ser kapîtalîzmê xwe ava dikir û koka koletiya jinê bû hilweşand û pêvajoya rizgariya civakî ya jinê da destpêkirin. Yek ji yekemîn biryarnameyên hikûmeta sovyetê biryarnameya jin û mêr bû. Ligel kişandina jinan a hilberana civakî seferberiyeke ku jinê ji kolebûna mutbexê, ji xizmeta zarok û mêr derxîne hat destpêkirin. Desthiladariya sovyetan di zagonên xwe de di mijara newekheviya jin û mêr de tu şop nehîştibûn.

Rêberê şoreşê Lenîn tena derxistina zagonan têre nabîne û qada ku jin jê rizgar bibe wek nav çar dîwarên malê dibîne. Vê nêrîna xwe wiha tîne ser ziman "Ligel tevahî zagonên ku jinê rizgar dike, koletiya jinê ya hundirê malê dîsa berdewam dike, ji ber ku karên malê yên biçûk ne girîng wê diperçiqîne û difetisîne, wê hapsî mutbex, odeya zarok û mêr dike. Dema ku li dijî ev nihêrvaniya malê têkoşîneke berfireh bê destpêkirin, ya hîna rast bi herikandina ev nihêrvaniya malê ya aboriya sosyalîst wê rizgariya rast a jinan, komûnîzma rast destpê bike."

Di sovyetan de di gelek qadan de gavên gelekî mezin û girîng hatin avêtin. Lê bi rêjeyeke girîng di hundirê malê de kedxwariya keda jinê berdewam kir. Di pêvajoya şerê duyem ê cîhanê de welidandina zarokan hat teşwîqkirin. Ev di heman demê de dihat wateya hîna zêdetir keda hundirê malê û kedxwariya kedê. Di sovyetan de jinan destkeftinên gelekî mezin bi dest xistin, lê ev destkeftin hîna pêş ve Ji ber ji nû ve vegerîna hilberana kapîtalîst jinan destkeftinên xwe bi rêjeyeke girîng windakirin.

Îro li Rojava di şoreşa me de gelekî jin di qadên cuda bixebitin jî piraniya jinan kedkarên malê ne. Karên malê dîsa li ser milên jinê ne. Jin di malê de bêberamber kedeke mezin xerc dikin. Jineke ku di kargehekê de xwarin çêdike, firax dişo, an jî zarokan xwedî dike mûçe distîne. Lê ligel ku jinên kedkar ên ku her roj di hundirê malê de 24 saet van karan dike, zarokan xwedî dike, lênihêrîna mêr û mezinan, paqijiya malê, şuştina firax û cilan, ûtî, birin û anîna zarokan ji dibistanê, amadekirina xwarin, xizmeta nexweşan, kirîna pêdîwiyên malê û hîna bi dehan karên ku em dikarin bijmêrin beramberiya vê kedê tune ye. Ev kar weke civakî karên xwezayî yên jinê tên dîtin. Lê dema ku jin van karan di kargehekê de bike wê ji karkerekî/ê navînî zêdetir pere qezenç bike.

Di şoreşa me de ji bo ku jin hîna zêdetir tevlî jiyana civakî bibin divê hewldaneke hîna mezintir bê dayin. Ji bo vê vekirina rawdayên bêpere, xwaringeh û cilşoxaneyên hevbeş wê gelekî girîng bibe. Di vê rewşê de erkên ku karibe jinê bikişîne navenda siyaset û jiyanê wê hîna siviktir bibin. Em şoreşa xwe ber bi şoreşeke sosyalîst ve bibin jî wê demekê hîna pozîsyona jinê ya hundirê malê neguhere. Ji ber vê yekê eşkerekirina ev keda jinê ya nexuya girîng e. Divê bê qebûlkirin ku ew karkereke ku li malê karên giran dike ye.

Divê em hem ji bo avakirina sosyalîzmê pergala kapîtalîst a milkê xas hilweşînin, hem jî têkoşîna li dijî serdestiya mêr di her qadê de mezin bikin. Divê em bi derxistina holê ya keda jinê ya malê têkîliyên jin û mêr biguherînin. Koletiya jinê ya hundirê malê bi milkê xas destpê kir û heta ku milkê xas civakî nebe wê koletiya jinê ya hundirê malê jî bi dawî nebe.

Ev wê di heman demê de weke bindestên jin û mêr hem têkoşîna me ya wekhevî û azadiyê û hem jî yekîtiya me ya li dijî kapîtalîstên ku dijminê me yê esasî ye xurt bike. Wê şertên meşandina bi hev re ya şoreşa civakî û şoreşa jinê bi tifaqa jin û mêrên ji çîna bindestan xurt bibe.

Pêşengên têkoşîna bindestan mêrên komûnîst û şoreşger, divê li dijî kedxwariya keda jinê bi rêya têkoşîna bîrdozî û siyasî bibin mînak. Divê di her qada ku tê de ne ji bo kar û barên malê hîna zêdetir erk bigirin ser milên xwe. Divê di hundirê malê û li her derê li dijî têkîliyên kapîtalîst ên serdestiya mêr ji bo afirandina têkîliyên sosyalîst û komûnîst rol bilîzin. Divê şiyara "Deriyên malên xwe ji şoreşê re vekin" li her derê bibe pratîkeke jiyanê. Dema ku jin azad nebe civak jî nikare azad bibe.

Di pêvajoya roja 25ê Mijdarê ya têkoşîna li dijî tundiya jinê de ne. Du xelekên ku di lêgerîna jinê ya wekhevî, edalet û azadiyê de bê têgihîştin eşkerekirina keda jinê ya hundirê malê ya nexuya û têkoşîna pêşlêgirtina tundiya li ser jinê ye. Li axên me yên şoreşê ku tundiya li ser jinê her ku diçe zêde dibe tundî encam e. Di bingehê de berdewamkirina koletiya jinê ya hundirê malê heye. Têkoşîna li dijî ev her du mijaran ji hev nayê qutkirin. Lê di navendê de nexuyabûn û girîng nedîtina keda hundirê malê û xurtbûna serdestiya mêr a civakî heye. Têgihiştina vê, civakîkirina keda hundirê malê, kirina vê ya mijara têkoşîna polîtîk wê têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê xurt bike.

Şehîdên Me Bingeha Têkoşîn û Bîrdoziya me ne!

Şehîd nirxên şoreşê yên herî giranbiha ne. Ji ber ku bingeha şoreşê li ser mîrasê wan ava dibe. Her şehîdek bi her dilopek xwîna xwe azadiyê dinexşîne. Tu şoreş bêbedêl nayê avakirin. Tevgera komûnîst jî li gorî vê rastiyê têkoşîna xwe bi mîrasê şehîdên xwe mezin dike û çavkaniya xwe ji manewiyata şehîdan digire. Şehîdê me yê yekemîn Erdal Balci di 3ê Mijdara 1994an de dema ku li bajarê Istanbulê (Stenbol) lafîte didaqiland bi êrîşeke polîsên faşîst ên dewleta Tirk şehîd ket. Partiyê îlana xwe bi dayina şehîd Erdal da destpêkirin. Li ser vê esas û manewiyatê meha Mijdarê weke meha şehîdan hat îlankirin. Di vê mehê de tevahî şehîdên şoreş û azadiyê tên bi bîr anîn. Kenê çavê wan çavkaniya me ya jiyanê, hêrsê wan ê dijmin sîleha me ya şer e. Xwedî derketina mîrasê şehîdan rastiyeke şênber e. Fêrbûna ji jiyana şehîdan nûbûyîn û qutbûna ji tevahî kevneşopiyên civakî yên paşverû ne. Tenê biryardayîn û tevlîbûna partî û şoreşê têre nake. Divê her kesayetekî/ê şoreşger û komûnîst tevahî jiyana xwe li gorî çand û exlaqa jiyana komûnîst sererast bike. Îro jiyan û pratîka bi hezaran şehîdên me vê rastiyê nîşanî me dide. Divê em di vê mehê de careke din li ser pratîka xwe ya şoreşgertiyê bifikirin û li dijî kêmasiyên xwe bi vî rengî têbikoşin. Bi wateya rast dagirtina cihê wan û bîranîna wan tenê ne devkî ye.

Em di meha şehîdan de di şexsê rêheval Metîn Dîcle û Ferhad Erebo de careke din li pratîka xwe binêrin.

Li Rojava Komûnîstekî Ereb: Ferhad Erebo

Rêheval Ferhad di bîranîneke şehîdan de partiyê nas dike. Belkî ew roja ku jiyana şehîdan li ser wî bandoreke ew qasî mezin kiribû texmîn nadikir ku wê rojekê bixwe jî bibe parçeyek ji vê manewiyatê. Di wê rojê de êdî ew mirovê têkoşînê ye. Li kuderê pêwîstiya partiyê hebe, partî jê kîjan erkê bixwaze ew bênîqaş li wir e. Ji bo wî her tim pêwîstiya rêxistinê erka sereke ye. Lê di heman demê de dev ji xeyalên xwe jî bernade. Ji rêxistina ciwanan heta ragihandina sosyalîst û heta Rojava xwedî vîneke mezin û girêdayî bîrdoziya partiyê ya Marksîst Lênînîst e.

Che Gîvarayê Rojava

Li Tirkiye rojnameger, li çiya gerîla, li Minbic fermandar, lê di heman demê de doxtorê şoreşê ye. Di nav koma yekemîn a gerîla ya ku derbasî Rojava dibe de ye. Ew bi xeyalên gelekî mezin berê xwe dide Rojava. Lê dema ku li Rojava pêwîstiya qada tendurîstî derdikeve bênîqaş daxwazên xwe dihêle aliyekî derbasî qada tendurîstî dibe. Bi gotina xwe Baytarê Tirkiye li Rojava dibe doxtor. Taybetmendiya wî ya herî berbiçav xwedî lê derketina nirxên partî û şoreşê ye. Ligel tevahî bêderfetiyan dibe avakerê qada tendurîstî û digîhêje hawara birîndaran. Dibe yek ji avakerên nexweşxaneya leşgerî ya şehîd Xebat. Bi çenteyê tendurîstî noxte noxte digere birîndar û gaziyan derman dike. Weke rêhevalekî Ereb ew êdî dibe doxtorê şoreşê. Weke Che Gîvarayê ku bi mîtora xwe ji Arjantîn derdikeve rê û nexweşiyên gelên bindest derman dike, li Kûbayê dibe rêberê şoreşê û li Bolîvyayê şehîd dikeve, rêheval Ferhat Erebo jî ji bajarê Antakyayê derdikeve rê, ji Tirkiye heta Rojava dibe pêşengê komûnîst ê şoreşa gelan.

Ew çavkaniya pratîka xwe ji girêdan û baweriya felsefeya komûnîst a Marksîzmê digire. Ji ber vê yekê dema ku bi giranî birîndar dibe ji bona mezinkirina şoreşgertiyê vê ji bo xwe weke astengiyekê nabîne. Berevajî pêvajoya birîndariyê ji bo wî dibe pêvajoyeke perwerde. Gotina wî ya "Bedêldayîn çiye? Bila hinek bedêl bidin ez nedim. Ez vê qebûl nakim. Birîndarbûn çiye? Lingekî çend santîm kinbûyî. Ger lingê min tunebe ez ê bi destê xwe bikim, ger destê min tune be ez ê bi çavên xwe bikim, ger çavên min tune be ez ê bi mêjî û moraldayina hevalên xwe bikim" bêsînoriya şoreşgertiya wî nîşan dide. Di tevahiya jiyana wî ya şoreşgertiyê de nehatiye dîtin ku bêhêvî maye an jî, di kêliyekê de jiyaneke bêrêxistinî fikiriye. An jî di tevahiya têkoşîna wî de nehatiye dîtin ku erkeke rêxistinî qebûl nekiriye. Divê ev sekn û pratîka şoreşgertiya wî ji me re bibe mînakeke bêsînor.

Jiyaneke Kurt û Pratîkeke Dagirtî Metîn Dîcle

Rêheval Metîn jî nasîna xwe ya partiyê bi girêdana şehîdan destpê dike. Girêdana şehîdan û partiyê ya wî di nav şoreşê de bi denga bilûra şivanan ve dibe yek û digêhêje asîmanan. Ew piştî komkujiya Pirsûsê ya ku tê de 33ê ciwanên komûnîst şehîd dikevin weke ciwanekî Kurd dikeve nav lêpirsîneke mezin. Gelo bi sedan ciwanên ku ji tevahî bajarên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê derketin rê kî bûn? Çi dixwastin û ji bo çi bi awayekî ew qasî hov hatin qetilkirin? Li ser van pirsan berê xwe dide komûnîstan û pirs li ser pirsan dike. Lê wî di roja 20ê Tîrmehê de hîna bêyî ku partiyê nas bike jixwe biryara xwe dabû. Di wê pêvajoyê de dibe bersiva bangewaziya partiyê ya tevlîbûna şoreşa Rojava. Hemû serpêhatiyên jiyana wî ya kurt li Rojava hîna mezintir dibe. Bi pratîk û kûrbûyîna xwe ya li ser bîrdozî ji bo ciwanan dibe pêşengê qewastinan. Di heman demê de kedeke bêsînor dide pêşketina xwe û di demeke gelekî kurt de qewastinên şoreşger ên mezin di jiyana xwe de şênber dike. Xwendin û fêrbûn çavkaniya qewastinên wî ye.

Nûnerê Xeta Welatparêziya Sosyalîst

Ew di heman de şênberbûyîna xeta welatparêziya sosyalîst ê MLKPê ye. Ew bi xebateke bêwestan û bi kedeke bêsînor li Rojava dibe pêşengê avakirina xeta welatparêziya sosyalîst. Bi sedan ciwanan perwerde dike û fikra komûnîzmê di mêjiya wan de dinexisîne. Bi behremendiyên xwe yên rêxistinkarî û bi hezkirineke xurt a gel dibe rêberekî xwezayî yê ciwanan û gel. Ligel emrê xwe yê gelekî ciwan ji 7 heta 70ê, ji ciwanan heta jinan herkes dikare berê xwe bide wî û ew bêwestan bi rojan wan guhdar bike. Ev taybetmendî dihêle ku di navbera wî û gel de têkîliyeke ku kes nikare biqetîne ava bibe. Tu carî bêhêvî namîne. Dema ku bêçaresarî dimîne hema berê xwe dide rêxistinê. Li ser vê esasê li dijî pirsgêrêkên herî dijwar dibe hêza çaresariyê. Ji ber ku ew dizane tu çaresariyên şexsî tu carî nabin çaresariyên mayinde.

Rêheval Metîn jî weke rêheval Ferhad tu carî xwestekên xwe yên şexsî weke astengî dernexist pêşiya rêxistinê. Ew bi gotina "Ez spasiya partiyê dikim ku derfet da min û ez hatim vê qadê û pêşketina min hîna kûrtir bû" girêdana xwe ya partiyê xulase dike. Gotina "Mazlûm Dogan ji bo me çawa ku Kawayê hemdemî bû, Rêheval Metîn jî ji bo me Kurdan Mazlûm Doganê hemdemî bû" ya rêhevalekî PKKyî yê ji Rojava rastiya rêheval Metîn bi zelalî vedibêje.

Rêheval Metîn û Ferhad weke pêşengên me yên komûnîst ên şoreşa Rojava îro weke bi hezaran û bi mîlyonan şehîdên şoreşê bangawaziya me dikin ku em hêvî û têkoşîna wan bigêhênin serkeftinê.

Komûnîstên Rojavayî di yekemîn salvegera şehîd Metîn Dîcle û Ferhad Erebo de ew bi bîr anîn. Di bîranînên ku li Kobanê, Hesekê, Dirbêsiyê û Qamişlo hatin lidarxistin de hat diyarkirin ku têkoşîna wan wê nîvçe nemîne.

Li Rojava Tûgayekî Sor

Bi lîstokeke nû hewldan hat dayin ku şoreşa Rojava bê kişandin zemîna pevçûna Kurd û Ereb. Bi taybetî hat xwestin ku bi fîtkirina eşîrên Ereb ew bibin aliyekî pevçûnê û dijminatiya navbera gelan ji nû ve bê xurtkirin û bi vê rêyê şoreşê ji hundir de bifetisînin. Ji bo niha ev lîstok negîhaşt armanca xwe. Ji ber ku dîroka şoreşa Rojava ya 12 salan berteka gelan a parastina şoreşê derxist pêş. Tevahî gel li paş Hêzên Sûrî yên Demokratîk (QSD/HSD) sekinîn û xwedî lê derketin.

Herêma Dêrazorê weke herêma herî dawî ya ku DAÎŞ tê de hatiye paqijkirin tê naskirin. Piştî ku ev herêm ji DAÎŞê hat rizgarkirin Rêveberiya Xweser û QSD li vir pergala şoreşê ava kir. Lê du aliyên Firatê di navbera Rêveberiya Xweser, rejîma Sûrî û hêzên Milîs ên Îranê de hat parçekirin. Piştî ku herêm ji DAÎŞê hatiye paqijkirin Ebû Xewle yê ku ji eşîra Egîdad ya herêmê yê herî mezin e bû berdevkê meclîsa leşgerî ya Dêrazorê. Lê piştî demekê dema ku Ebû Xewleyê ku di heman demê de serokê eşîrê bû, tevlî karên tarî û qirêj ên wekî bazirganiya hişbir, destdirêjiyê bû. Ji ber vê yekê ji aliyê QSDê ve ji erkê hat dûrxistin. Ebû Xewle destdirêjiya sê jinan kiribû û ew qetilkiribûn. Ji bo ku bê dadgehkirin lê dihat geriyan, ew reviya û xwe veşart. Ebû Xewle li Hesekê di malekê de hat girtin û di mala wî de 14,5 mîlyon dolar pere derket û ew hat girtin. Derket holê ku Ebû Xewle bi rejîma Sûrî, Îran û Tirkiyê re li hev kiriye û wê li dijî Rêveberiya Xweser bi hêza eşîrên Ereb serhildanekê bide destpêkirin. Lîstok ev bû. Li ser vê esasê ji alî QSDê ve li dijî ev çeteyên ku navên wan derbas dibe operasyoneke ewlehiyê hat destpêkirin. Di heman demê de dewleta Tirk a faşîst û dagirker li Serê Kaniyê û herêma BABê ya ku dagir kiriye qaşo bi navê hêzên leşgerî ya eşîran li Minbic û Til Temir êrîş da destpêkirin. QSDê bi berxwedaneke mezin her du êrîş jî dan sekinandin û komên çeteyan windahiyên mezin dan û derbeke giran xwerin.

Tûgaya Şehîd Elîşêr Denîz

Şervanên Tûgaya Elîşêr Denîz ên ku gundê Tewîla ya Til Temirê diparêzin li dijî êrîşa ku çeteyên dewleta ji bo piştgiriya Ebû Xewle destpêkirîbûn bi berxwedaneke mezin bersiv dan. Tûgaya Şehîd Elîşêr Denîz ku ev 7 sal e bê navber parastina şoreşê dike û ji ciwanên Kurd û Ereb pêk tê di her cepheyê de erka xwe ya parastina şoreşê bi cih anîye û heta niha 7 şehîdên wê hene. Tûgaya Şehîd Elîşêr Denîz nêzikî 3 salan e erka xwe ya cephe li dijî leşger û çeteyên dewleta Tirk meşand û çalakiyên bê hejmar pêk anî. Li ser vê rastiyê jî bû xwedî baweriyeke bi maf û rûmet. Tûgaya şehîd Elîşêr Denîz di nav hêza QSDê de bi berpirsiyariya bûyîna hêzeke komûnîst û tûgayekî sor li cepheyê bi pratîka xwe rêzdariyeke bi maf pêk tîne û di meşa xwe berdewam dike.

Berxwedana Gundê Tewila

Sibeha ku hemleya Dêrazorê destpêkiriye nêzikî 100 çeteyan bi êrîşkirina gundê tewîla hewl dan ku rêya dagirkirina Til Temir vekin. Di esasê de li ser Til Temir kes ne li benda êrîşeke bi vî rengî bû. Hîna zêdetir em li benda êrîşên li ser xetên nêzikî dijmin bûn. Istixbaratên ku dihatin li ser vê esasê bûn. Hema di cih de bersiv hat dayin çeteyên ku ketin gundê Tewîla. Di şerê ku nêzikî 6 saet berdewam kir de 25 çete hatin kuştin û 41 jî ji wan birîndar bûn û di encama vê de bêyî mêzekirina li paş xwe reviyan. Tewîla cara yekem bi êrîşeke ew qasî mezin ve rû bi rû mabû. Di dawiyê de gotina ku herkesî dikir wiha bû "Baş e ew hatin Tewîla, ev bû têkçûna wan"

Di êrîşê de şervanekî me bi sivikî birîndar bû û derveyî vê tu windahiyên me çênebûn. Em bi rihetî dikarin bêjin ku li dijî êrîşeke ew qasî mezin ev berxwedan serkeftineke gelekî mezin bû. Dîsa bersivên bi henek ên ku şervanan li dijî bangewaziya çeteyan a "teslîm bibe" hêjayî dîtinê bû. Komên çeteyên ku li dijî xeta Tewîla bi cih bûne ji çeteyên ku tên êrîşê re dibêjin neçin hûn nikarin wan têk bibin û tevlî wan nabin. Dema ku çete ji Tewîla direvin jî ew çeteyên din dîsa ji wan dibêjin "me ji we re gotibû divê hûn neçûyana." Dîsa çeteyên ku tên êrîşê dema ku tên dîmenan dikişînin û serkeftina xwe îlan dikin. Ew di wê fikrê de ne ku wê serkeftineke hêsan bi dest bixin. Lê dema ku derba yekem xwarin hawara hêzên paş xwe dikirin û digotin "werin alîkariya me, me hemûyan dikujin." Lê hejmara wan bi giştî 5 qatî zêdetirî hejmara şervanên Tûgaya Elîşêr Denîz hîna bûn. Hatin, dîtin û bêyî ku li paş xwe binêrin meyîtên xwe li erdê rakişandin û reviyan. Piştre tiştên ku hatin bîhistin hîna ecêp bû. Şêxê çeteyan ê ku wan dişîne êrîşê dema ku koma çeteyên sax mayî vedigere wan dîsa kom dike û dibêje "ka dîsa biçin û tola xwe rakin" Ew jî dibêjin "tu nabînî niviyê me jî venegeriya, ma di me de hal ma" lêdan li şêx dikin.

Em ê Şoreşê Xwe Biparêzin

Hûn jî dizanin ku li dijî êrîşeke bi vî rengî efsane û vegotina destanî ya berxwedan û şervantiya ku derdikeve holê hîna zêdetir dibe. Lê em dizanin ku tiştê herî girîng ê ku mê xurt dike amadekarî, perwerde, girêdana me ya şoreş û axên me ye. Em li Rojava bi berpirsiyartiya bûyîna tûgayekî sor dikarin bêjin ku em ê weke rêhevalên xwe yên ku ji Stalîngrad heta Spanyayê şer kirine û şehîd ketine çi pêwîst be bikin. Dîsa em diyar bikin ku li cepheyên Rojava şervanên sor ji bo ku şoreşê biparêzin di xeta agir de weke aleke ku dıheje li bendea dijmin in. Şervanên Tûgaya Elîşêr Denîz dibêjin "şoreş wê hîna gelekî bi lîstok, fen, fît û êrîşan ve rû bi rû bimîne. Parastina wê deynê stûyê me ye." Her êrîşeke ku bê anîn ser şoreşê, her gaveke ku şoreşê parçe û dijminatiya navbera gelan mezin bike wê bi berxwedana zarokên şervan ên gel ve rû bi rû bimîne. Li ser vê axê cara yekem gelên vê herêmê bi hev re û bi kişandina hilma azadiyê dijîn. Ev jî bi saya keda zarokên şoreşê yên têkneçûyî mayinde dibe. Soza me ya dawî ya ji gel û şehîdên xwe re em li vir in, em li bendê ne...

Li Dijî Koçberî û Hişbirê Têkoşîn

Wekî ku tê zanîn şoreşa me ya ku weke şoreşa jinê tê naskirin, şoreşa ku em tê de ji dayik bûn û mê tê de jiyan nas kir bi bedêlên mezin ên şehîd, têkoşer û gelê me yê welatparêz û ciwanên me yên fidakar gîhaşt roja me ya îro.

Di asta ku şoreşa me gîhaştiye de destkeftiyên gelekî mezin hatin bi dest xistin. Îro jî em ji bo pêşxistin û parastina şoreşa xwe kêlî bi kêlî bedêl didin û li hemberî êrîşên dijmin ên ku ji her alî ve me dorpêç kirine li ber xwe didin. Ciwanên Rojava jî ji destpêka şoreşê de bi fidakariyeke mezin di her qadê de rola xwe lîstin.

Dema em li wêneyên şehîdên xwe dinêrin û çîrokên jiyana wan fêr dibin, em dibînin ku piraniya wan hîna di temenê xwe yê biçûk de tevlî şoreşê bûne û ji bo ku pêşerojeke xweş ji zarokên Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê re bihêlin bi dil û can têkoşiyane û bûne nemir.

Şoreşa me nirxên ewqas mezin afirand ku tu gotin nikare vê şirove bike. Hişmendî, çand û pêşketina exlaqî ya nû ku tê xwestin îro jî bi pêş dikeve û diguhere.

Ev pêşketin û pêşveçûn pêşketineke ku pergala serdest a mêr û faşîzm naxwaze ku pêk were ye. Ji ber ku dema ciwan bi hişmendiyeke nû li hemberî pergalê rawestin, koletî û xizmetkirina burjuvaziyê qebûl nekin û ji bo cîhanek wekhev têbikoşin wê dawiya pergala kapîtalîst nêziktir bibe.

Rêbazên Şerê Taybet

Ji ber vê hêzên emperyalîst-kapîtalîst dixwazin li ser gelê me yê şoreşger û welatparêz rêbazên şerê taybet pêş bixin. Bi van rêbazan tirsandina gel armanc digirin û hewl didin ku mirovên ku nafikirin, napirsin û şer nakin biafirînin.

Du rêbazên şerê taybet ên ku di van demên dawî de li ser xaka me ya şoreşê bênavber tên bikaranîn hene.

Rêbaza yekem; hewl didin ku ciwanên ku pêşeroja şoreşê ne, bikişînin nav çola hişbir û wan ji siyaset, têkoşîn û nirxên welatparêzî û şoreşgerî dûr bixin. Dewleta Tirk a faşîst bi rêya rêxistinên taybet ên istixbarat û çeteyên xwe yên li herêmên ku dagir kiriye hewldana qutkirin û dûrxistina ciwanan a ji nirxên şoreşê dide.

Bajarên ser sînor ên ku di bin dagirkeriya wê de ne bûne warên bazirganiya madeyên hişbir. Ew ligel ku di gelek mijaran de bi rejîma Esad re nakokiyan dijîn, lê li ser vê mijarê danûstandinên qirêj dikin. Qezençkirinên aborî yên mezin bi rêya bazirganiya madeyên hişbir bi dest dixin û di heman demê de hewl didin ku şoreşa me qirêj bikin.

Her ciwanek ku bi madeyên hişbir ve tê girêdan ji bo wan dibe destkeftiyeke mezin. Ji ber ku bikaranîna madeyên hişbir tê wê wateyê ku ciwan ne tenê têkîliya xwe ya bi şoreşê re winda dike, di heman demê de her tiştê xwe yê girêdayî mirovahiyê winda dike. Mêjî dicemide û mirov gav bi gav dûrî hebûna xwe dikeve.

Rêveberiya Xweser û Hêzên Asayîşê her roj bi fidakariyeke mezin ji bo ku pêşî li ber vê bigirin li dijî çete û şebekeyên hişbir çalakiyan lidar dixin. Lê ev tena bi serê xwe têre nake.

Divê ciwan li her qada jiyanê li dijî ev şerê taybet şiyar bibin. Divê em kesên ku li tax û bajarên me de vî karî dikin derxin holê û piştgirî bidin hêzên ewlekariyê û li ku pêwîst be jî, bi rêbazên xweparastinê wan bidin cezakirin.

Divê mirov tu carî bi vê fikrê nêzikî madeyên hişbir nebe ku "ji carekê ceribandina wê tiştek nabe", an jî "ew ê demekê bikar bîne û dû re bisekine". Divê em bi kesên ku ûsa difikirin bidin fêmkirin ku ev xiyaneteke li dijî nirxên şoreşê ye û bikaranîna hişbir xizmetê dijmin dikin.

Rêbaza şerê taybet a duyem ku dijmin kar tîne jî hewldana koçberkirina ciwanan a welatên Ewropayê ye. Faşîzma ku êrîşa ziman, çand û hebûna gel dike bi koçberkirina wan dixwaze axên şoreşê vala bike û li erdnigariyên ku dagir kiriye asîmîlasyonê mayinde bike.

Bi xeyalên xwe yên Osmanî dixwaze van deran bike herêmên di bin destê xwe de. Li hemberî hemû êrîşên li ser xaka Şoreşê Rojava çiqasî berxwedan mezin dibe, ew qas li cihên ku dagir dikin polîtîkayên xwe yên înkar, îmha û asîmîlasyonê xurtir dikin.

Dixwazin ku bicihkirina çeteyên DAÎŞê û malbatên wan li bajarên me yên weke Serê Kaniyê, Girê Spî û Efrînê yên dagirkirî, demografiya herêmên me biguherînin û hemû şopên dîrokê ji holê rakin. Îro jî bi êrîşên dagirkeriyê yên li ser herêmên Rêveberiya Xweser û embargoyên li ser deriyên sînor hewl didin ku gel bikin dijminên şoreşê û neçar bimîne ku ji axa şoreşê derkevin. Ji ber vê yekê di heman demê de êrîşên xwe yên aborî jî kûrtir dikin.

Serkeftina şoreşê bi bedelên mezin hatiye bi dest xistin. Parastina wê jî wê bi bedelên mezintir pêk were. Ji ber şoreşa me ya jinan a demokratîk-gelperêz hêvî û ronahî dide bindestên hemû cîhanê. Divê em ji rêbazên şerê taybet û nefsî yên dagirkeran netirsin û ji nêzikatiyên ku xizmeta wan dike dûr bikevin.

Bi taybetî divê ciwan bi xwendina li pergala perwerdehiya Zanîngeha Rojava ya zanîstî, ekolojîst û azadiya jinê pêşeroja xwe misoger bikin û bi hemû hêza xwe li hemberî pirsgirêkên ku dijmin hewl dide biafirîne têbikoşin. Divê xwendina li ser zanîstî, dîrok, serpêhatiyên şoreşên welatên cuda, felsefe, diyalektîk û HWD. hîna zêdetir bibe.

Li hemberî van rêbazan hişyar be

Xewna çûyîna Ewropa xewneke vala ye û tê wateya tunekirina cewher, çand, ziman û dîroka mirov. Îro hemû welatên Ewropa yên emperyalîst penaberên ku ji şerên Rojhilata Navîn reviyane û xwe li wan girtine wek hemwelatiyên çîna sêyem digirin dest. Hewl didin ku wan ji çand û jiyana civakî dûr bixin. Bi sed hezaran koçber li ser sînoran jiyana xwe ji dest didin û li dijî vê poşmaniyek an jî berpirsiyartiyeke herî biçûk li ser xwe nabînin.

Ji bo wan tiştê girîng ne jiyana mirovan, berjewendiya dewleta wan e. Ji ber vê yekê divê hemû ciwanên Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, li dijî van polîtîkayên koçberiyê helwesteke welatparêziyê nîşan bidin.

Divê em rê nedin ku ciwanên me yên ku li ser rêyên koçberiya Ewropayê bi kiryarên nemirovane rû bi rû bimînin, yan jî rûmeta xwe winda bikin û li ser rêyên koçberiyê bi xeyala çûyîna Ewropayê jiyana xwe ji dest bidin. Divê em jiyaneke bi vî rengî layiqî xwe nebînin û li hemberî vê bi hişmendiyeke welatparêzî têkoşîna xwe ya bîrdozî mezin bikin.

Divê em gavekê jî ji axa xwe ya şoreşê ya ku me ji şehîdên xwe mîras girtiye dûr nekevin û rê nedin tu xirabiyên paşverû û qirêj ên mîna madeyên hişbir û hwd. li ser xaka şoreşê bên meşandin. Rêya yekena ya azadî û jiyaneke birûmet têkoşîna li dijî dagirkerî û mêtîngeriyê ye. Ji ber vê yekê em bang li hemû ciwanan dikin ku di nava refên CKŞê de bi rêxistin bibin.

Ciwanên Komûnîst ên Rojavayî di salvegera serhildana "Jin Jiyan Azadî" de ji bo silavkirina gelê Rojhilatê Kurdistanê li ber navenda çandê ya Şehîd Metîn çalakiyek lidar xist.

Di Dîrokê De Çîroka Lêhengekî: Gassan Kenefanî

Di 8ê Tîrmeha 1972an de ji aliyê îstixbarata Îsraîlê ve li herêma Hazmie ya nêzî Beyrûtê bi teqandina otomobîla wî ew bi biraziyê xwe yê bi navê Lamis ve şehîd dikeve. Dema ku şehîd dikeve ew endamê Komîteya Navendî ya Eniya Gel a Rizgariya Filîstînê û di heman demê de berdevkê partiyê bû. Zêdetirî bîst berhemên wî yên çîrokî, lêkolînî û wêjeyî hene. Berhemên wî bi 18 zimanan hatine wergerandin û li 20 welatên cuda hatine çapkirin. Çîroka nivîskarê têkoşer û şoreşger bi şehîdbûna wî dawî nebû, berevajî ji bo tevahî şoreşgeran weke mîrasekî mezin ma.

Şehîd Gassan Kenefanî di 4ê Nîsana1936an de li bajarê Akkayê ya Filistîna dagirkirî ji dayik bû. Bavê wî li Akkayê parêzer bû. Piştre koçî Yafayê kirin û zaroktiya xwe li wir derbas kir. Hîna di van salan de bû şahîdê bûyerên aloziya parçekirina Filîstînê. Di sala 1948an de dagirbûna Akkayê ji bo wî dibe xala weçerxê.

Malbata wî berê koçî Başûrê Lubnanê, paşê jî koçî Şamê dibe. Xwendina xwe li vir diqedîne. Di dibistanên penaberan de weke mamoste dixebite. Ji bo xwendina wêjeya Erebî diçe zanîngeha Şamê. Di sala 1953an de bi riya Corc Hebesh beşdarî Tevgera Neteweperest a Erebî dibe. Û li wir jî di bin bandora wî de dimîne. Lê komkujî û kiryarên ku bi rêya siyonîzma Îsraîlê hatibû serê gelê wî hêrsê wî yê herî mezin bû.

Di dawiya sala 1955an de li Kuweytê di Zanîngehê de weke mamostetî dixebite û li vir dest bi redaksiyona rojnameya siyasî dike û di heman demê de bi navê Ebû El Ezêz nivîsan dinivîse.

Di destpêka şoreşa 1958an de di dema desthiladariya Ebdulkerîm Qasim de serlêdana Iraqê dike. Piştî ku vedigere jî bi navê Ebû El Ezêz li ser êrîşên rejîma wî kurteçîroka xwe ya bi navê "Qemîsê dizî" dinivîse di pêşpirka wêjeyê de xelata xwe ya yekem distîne.

Di sala 1960an de diçe Beyrûtê û di kovara El-Huriya de, ku berdevkê Tevgera Neteweperestên Ereb de dixebite û weke sernivîserê rojnameya El-muherr a Lubnanî dixebite. Paşê derbasî El-Enwar El-Lubnanî dibe. Di sala 1961an de bi Jineke Danîmarkî a Ji bo ku wê di derbarê meseleya Filistînê de ronî bike nas dike û piştre bi wê re dizewice. Fares Fares yek navên ku Gassan Kenefanî nivîsên xwe yên rojnameyê pê dinivîsand bû.

Gotara wî ya bi navê "Destana bizinê û Gur" berî şehîdketina wî gotara wî dawî ya ku di kovara El-Seyad a Lubnanî de hatîbû weşandin bû. Tevî ku nexweşiya şekir jî lê peyda bû wî rojekê dev ji doza xwe berneda. Kenefanî lêhengê çîrokeke ku wêje, ragihandin û siyasetê di nav hev de dihewîne ye.

Ev rastî heta dawiya jiyana xwe dibe bingeha çîroka jiyana wî. Berhemên wî yên wêjeyî êşên gelê xwe yên ji ber dagirkeriyê û biyanîbûnê dihewîne. Xurtbûna wî ya herî mezin fikra wî ya zelal a li dijî siyonîzma Îsraîl û dagirkeriyê ye. Ew li dijî siyonîzm û dagirkeriyê xwedî fikreke gelekî zelal e. Ji bo wî derveyî şer tu rêyên din ên azadiyê tune ye. Ji ber vê yekê ew dibe hedefa dewleta Îsraîlê. Rojevên nivîsên xwe ji rastiya serpêhatiyên wî îlham digire. Wekî xebatên wî yên di dibistana penaberan a li kampan de êşên ku rastê hatiye dibe bingeha têkoşîn û nivîsên wî. Ramanên wî yên têkoşîna çekdarî dibe bingeha têkoşîna gelê Filîstînê. Çi bi ramanên xwe û çi jî bi tevlêbûna xwe ya pratîk di xebata siyasî de dibe yek ji rêberên têkoşîna doza Filîstînê.

Avakirina Eniya Gel

Piştî têkçûna Tevgera Neteweperest a Ereb û têkçûna Hezîrana 1967an, Eniya Gel a Rizgariya Filistînê di dawiya sala 1967an de hat damezrandin. Gassan Kenefanî kovara "El-Hedaf" ku berdevkê Eniyê ye, damezrand. Ew bi ked û pêşketina xwe ya bêsînor bû berdevkê Fermî yê Eniyê. Her wiha gelek afîşên Eniya Gelêrî dîzayn kir û gelek tabloyên temsîlî xêz kir. Ew hîna di 31 salên xwe de li ser kûrbûyîna bîrdozî û siyaseta şoreşgertiyê bername û stratejiya rêxistinê dinivîse û dibe yek ji rêberên şoreşger ê rêxistinê.

Dema ku peyv ji agir xurtir be

